**K.T**

**Zanîngeha Mardîn Arukluyê**

**Enstîtuya Zimanên Zîndî yên Li Tirkîyê**

**Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

# NAVDÊRÊN KURMANCÎ

**Gülistan KARA**

**12721282**

**Şêwirmend**

**Pey. Hîn. Mikail BÜLBÜL**

**Mêrdîn 2013**

# NAVEROK

**DESTPÊK** ..... **3**

**DI KURMANCÎ DE NAVDÊR** ..... **4**

1. JI ALIYÊ TAYBETMENDIYA BIKARANÎNA XWE VE NAVDÊR ..... 4
   *1.1. Hevenav* ..... *4*
   *1.2. Serenav* ..... *5*
2. JI ALIYÊ HEBÛNA XWE VE NAVDÊR ..... 5
   *2.1. Navdêrên Şênber* ..... *5*
   *2.2. Navdêrên Razber* ..... *6*
3. JI ALIYÊ MÊJERA XWE VE NAVDÊR ..... 6
   *3.1. Yekjimar* ..... *6*
   *3.2. Pirjimar* ..... *7*
   *3.3. Komenav* ..... *7*
4. JI ALIYÊ JIMARBARIYÊ VE NAVDÊR ..... 8
   *4.1. Navdêrên Jimarbar* ..... *8*
   *4.2. Navdêrên Nejimarbar* ..... *8*
5. JI ALIYÊ ZAYENDÊ VE NAVDÊR ..... 9
   *5.1. Zayenda Biyolojîk* ..... *9*
      5.1.1. Navdêrên Nêr ..... 9
      5.1.2. Navdêrên Mê ..... 9
   *5.2. Zayenda Rêzimanî* ..... *10*
      5.2.1. Navdêrên Nêr ..... 10
      5.2.2. Navdêrên Mê ..... 10
      5.2.3. Navdêrên Nêtar (Nêremê) ..... 11
6. PEYVSAZIYA NAVDÊRAN ..... 11
   *6.1. Navdêrên Xwerû* ..... *12*
   *6.2. Navdêrên Nexwerû* ..... *12*
   *6.3. Navdêrên Pêkhatî* ..... *12*
   *6.4. Navdêrên Hevdudanî* ..... *13*
7. NAVDÊRÊN BINAVKIRÎ Û NEBINAVKIRÎ ..... 13
8. GELEMPERÎKIRINA NAVDÊRAN ..... 14
9. PEYWIRA NAVDÊRAN ..... 15
   *9.1 Raveka Navdêran* ..... *15*
   *9.2.Tewanga Navdêran* ..... *15*
   *9.3. Neyîniya Navdêran* ..... *16*
10. REŞKIRIN XWEŞKIRIN BIÇÛKKIRIN Û BANGEWAZIYA NAVDÊRAN ..... 17
   *10.1. Xweşkirin* ..... *17*
   *10.2. Reşkirin* ..... *17*
   *10.3. Biçûkkirin* ..... *17*
   *10.4. Bangewazî* ..... *18*
11. JIMARNAV ..... 18
   *11.1. Jimarên Xwerû* ..... *18*
   *11.2. Jimarên Hevdûdanî* ..... *18*

**ENCAM** ..... **20**

**ÇAVKANÎ** ..... **21**

## DESTPÊK

Gotinên ku heyber û têgehan dinimînin û didin nasîn nav in. Nav xwedî wateyeke berfireh e; ji bo vê yekê jî di rêzimanan de Nav/navdêr tê bikaranîn. Rengdêr, cînavk, hoker, daçek, gihanek û baneşan jî bi eslê xwe navdêr in. Navdêr di xwe de liv û tevgerê nahewînin, bi vî awayî ji lêkeran tên veqetandin.

Pêvîst e em qala pênasa navdêran jî bikin, bêjeyên ku li tiştên hene hatine danîn, tên danîn û yên ku bên danîn di rêzimanê de ji wan re navdêr tên gotin. Her wiha bêjeyên ku rast in an jî di sêwirandinê de (raman) ji heyînan re dibin nav, navdêr în. Navdêr li mirovan, li ajalan, li tiştên şênber û razber û heyînên din tên danîn.

Di kaînatê de çi tişt hebe pêwîst e navekî jê re hebe, çi tiştê ku hatibe afirandin bi navekî tê nasîn. Di zimanekî de girîngiya navdêran pir zêde ye. Di zimanekî de tiştek bi çend awayê cuda bê bikaranîn, ew ziman ew qas dewlemend tê hesibandin. Heke ku em mînakek bidin, di tirkî de gotina "burun", di kurmancî de wekî "poz, firnik, bêvil û difin" di nav gel de tên bikaranîn û vê yekê jî dewlemendiya zaravayê kurmancî ye.

Îca em binihêrin ka gelo navdêr çi tişt in? Nav ew tişt e ku li hemû eşyayî tê kirin û dibe mîna sembola wî tiştî, gava ku em gotina tav ango roj dibihîsin di mêjiyê me de şemaya ku roj tê fêmkirin pê dikeve.

Wekî ku me li jor jî anî ziman, zimanê kurdî wekî ku ji her awayê xwe ve dewlemend e, ji aliyê navan ve jî gelek dewlemend û bi pêş ketiye. Ji ber ku zimanê kurdî zimanekî dêrin û zindî ye, her tişt bi awayekî balkêş di kurdî de ciyê xwe girtiye.

## DI KURMANCÎ DE NAVDÊR

Di fezayê de tiştekî ku nav lê nehatibe danîn tuneye. Stêrk û gerestêrkên ku nû tên kifşkirin jî tafilê bi navekî tên binavkirin. Ango em dikarin bibêjin, hemû tiştên ku em dibînin, bi pênc lebatên xwe yên sehekê radibihîzin (heyinên şênber) û yên ku em nabînin û bi pênc lebatên xwe yên sehekê nikarin bihezirin (heyinên razber) bi tevayî xwedî nav in.[1]

Bêjeyên ku li tiştên ku hene hatine danîn, tên danîn û yên ku bên danîn di rêzimanê de ji wan re navdêr tên gotin. Her wiha bêjeyên ku rast in an jî di sêwirandinê de (raman) ji heyînan re dibin nav, navdêr in. Navdêr li mirovan, li ajalan, li tiştên şênber û razber û heyînên din tên danîn.[2]

Nav beşek ji beşên sereke yên axaftinê ye. Bi alîkariya kategoriyên rêzimanî wateyên nasyarî, nenasyarî, zayend, mêjer û rewşa tiştandide. Navên dariştîbi riya pêvzeliqandinê tên dariştin. Nav di rewşa xwerû de zayend û mêjerê diyar nake. Mêjer, zayend, nasyarî û nenasyariya navan di dema axaftinê de bi alîkariya awayên rewş, qertaf û awayên hevbendiyê tên derbirîn.[3]

**Mînak:** Pirtûk, çiya, kevir, xal, mam, met, karker, nivîskar, bijîşk, endezyar, Elî, Ehmet, Hêlîn, Amed, Ararat, Xweda, Yezdan, dil, dîl, rez, kûsî, kew, kevok, kûçik, rûvî, destar, gîsin, conî, şonik, cêr, bêr, das, mer, stêrk, esîman, heyv û hwd.

### 1. Ji Aliyê Taybetmendiya Bikaranîna Xwe ve Navdêr

Navdêr di nabera xwe de li gorî taybetmendiya bikaranîna wan du beş in. Ew jî ev in:

**1.1. Hevenav**: Navdêrên ku tiştên wekî hev tînin ziman, ji wan re hevenav tê gotin.

**Minak:** Çiya, kûçik, mirov, heywan, destar, sêv, hirmê, biyok, pisîk, şêr

Di gelek gotinên pêşiyan de jî navdêrên hevenav derbas dibin ku mirov dikare van gotinên pêşiyan wekî mînak nîşan bide:

"**Şêr şêr** e çi **jin e** çi **mêr** e."

---

[1] Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Weşanên Dîwan, 2011, Stenbol, r. 76.

[2] Azad Zal, *Zimanê Kurdî,* Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2009, r. 135.

[3] Qanatê Kurdo, *Rêzimana Kurdî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 59.

"**Kûsî** hat ji **newal**ê bû xwediyê **mal**ê."

"**Kevir**ê **havîn**ê bavê je **kadîn**ê."

"**Çiya** çi qas **bilind** be **roj**ek **rê** lê diçe**."**

**1.2. Serenav**: Tiştên ku di kaînatê de tekane ne serenav in, hevşibên serenavan tune ne. Navên kesan, navên nîjad, ol û dewletan, navên welatan, navên zimanan, navên mesheban, navên eşîretan, navên saziyan, navên komeleya, navên dibistanan, navên rojname û kovaran û hw. **Serenav** in, û li gor rêzimanê tim herfên mezin tên nivisandin. [4]

**Mînak:** Elî, Ehmet, Ezîz, Şoreş, Bêrîtan, Tirk, Kurd, Ereb, Rûs, Îngilîz, Tirkiye, Îraq, Rûsya, Îran, Ermenistan, Zanîngeha Artuklu, Zanîngeha Dîcle, Zanîngeha Firat û hwd.

Di nav hevokê de bikaranîna navdêrên serenav:

**Elî** ji **Tirkiye**yê ye û li Zanîngeha **Dîcle**yê dixwîne.

B**êrîtan** ji **Qilabanê** ye û ew li dibistana **Şêxan** dixwîne.

Di Şerê **Cîhanê** yê yekem de Rûs, Îngilîz û Frensî bi **Osmaniyan** re şer kirine.

**Zanîgeha Artuklu**yê beşa **Kurdî** vekiriye.

**2. Ji Aliyê Hebûna Xwe ve Navdêr**

Navdêr li gorî hebûna xwe dibin du beş:

**2.1. Navdêrên Şênber:** Vê cureyê li kaînatê ciyekî dadigirin û bi lebatên sehkirinê (poz, guh, çav, ziman û çerm) mirov dikare wan hîs bike.[5]

**Mînak:** Dar, av, agir, şor, tirş, tûj, tehl, deng, pirtûk, gul û hwd.

Di nav hevokê de navên şênber:

Xwarin pir **şor**e. (bi ziman tê tehmkirin.)

Pelên dara **şîn** bûne. (bi çav tê dîtin.)

**Deng** ê pir ji dûr di hat (bi goh tê sehkirin.)

**Behna** gulên sor pir xweş e. (bi poz tê bêhnkirin.)

[4] Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012, r. 55.

[5] Mikaîl Bilbil & Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdiya Amedê, Stenbol, 2008, r. 39.

Ava vê kaniyê pir **cemidî** ye. (bi çermê canê xwe tê pelandin.)

**2.2. Navdêrên Razber:** Hebûna wan cure navan nayête rabihîstin, lê ji hebûna wan tê bawerkirin. Ew tiştên pêjnî ne. Em bi tenê dikarin wan bifikirin û bi aqil têbigihîjin.[6]

**Mînak:** Xem, tirs, fikir, evînî, cin, perî, mêrê şevê û hw.

Di nav hevokê de navên razber:

**Derdê evîniyê** pir zor e.

Ez pir **xemgîn** im.

Ez bê **tirs** û bê **xof** im.

Zarok di xew de **cin û peri**yan didît**.**

### 3. Ji Aliyê Mêjera Xwe ve Navdêr

Navdêr Ji Aliyê mêjara xwe dibin sê beş:

**3.1. Yekjimar:** Di kurmancî de navdêrên yekjimar dema ku xwerû bin, netar in. Di dema ravekê de zayenda wan diyar dibe. Di ravekê de heke navdêr, di ciyê raveberê de be, bi qertafên veqetandekê zayenda wan diyar dibe; heke di ciyê ravekerê de be, bi qertafên tewangê zayenda wan diyar dibe. Navdêr bi saya qertafa "-ek"ê, ji diyariyê derdikevin û dibin nediyar. Her wiha yekjimariya navdêran bi alîkariya tewang û veqetandekê tê nîşandan. Ligel yekjimariya navdêran, zayenda wan jî diyar dibe.[7]

**Mînak: (veqetandek)**

Met**a** min çû bêriyê.

Ap**ê** min ji eskeriyê hat.

Biray**ekî** min hebû.

Diy**a** min li gund e.

[6] h.b.

[7] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdiya Stenbolê, Stenbol, 2005, r. 97.

**Mînak (tewang)**

Erd**ê** cot bike.

Çêlek**ê** bidoşe.

Zînê av vexwar.

Ehmed sêv**ê** dixwe.

Kawa cilê bin**î** dikire.

**3.2. Pirjimar:** Di kurmancî de ji bo diyarkirina pirjimariya navdêrên xwerû tu qertaf tune ne. Lewra dema ku navdêr bi serê xwe be, pirjimar nabe. Mêjara navdêrên xwerû di hevokê de bi alîkariya lêkerê tê nîşandan.

**Mînak:**

Çivîk firî.

**Çivîk firiyan.**

Çêlek hat.

**Çêlek hatin.**

Min **masî** girt.

Min masiy**an** girt.

**3.3. Komenav:** Vê cureya navdêran, komekê nîşan didin, tevî ku bi xwe piraniyekê di nava xwe de dihewînin jî, lê wekî yekjimar têne pejirandin.[8]

Em di nav hevokê de çend mînak ji komenavan bidin:

**Gelê** me pir zehmetî kişandiye.

**Neteweya** wî ereb e.

**Garana** gund li çolê maye.

[8] Kadrî Yildirm, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi,* Weşanên Zanîngeha Artukluyê, Stenbol, 2012, r. 203.

**Artêş** ji milyonekî zêdetir e.

**Keri**yê pez li hêviya berîvanan bû.

**Refê** kewa ji ber nêçîrvanan direviya.

**Daristanên** gund tev şewitîn.

**Colê** hespan li ber derî ye.

Kî bûk be ew **berbûrî** ye**.**

**4. Ji Aliyê Jimarbariyê ve Navdêr**

**4.1. Navdêrên Jimarbar:** Hinek tişt bi heban tên jimartin, lê hinek tişt nayên jimartin. Ên ku tên jimartin ji wan re jimarbar tê gotin.

**Mînak:** Sêv, hirmê, jin, kulîlk, gund, mîr, mişmiş, xurme û hwd.

Ji bo ku mînakê me xweş bên fêmkirin, em di nav hevokê de çend mînakan bidin:

Dara **sêv**ê **îsal** pir girtiye.

Werin **hirmi**yan.

"**Mîr** Mihê **heftê** felek çûn.

Ji hîcretê dewran gelek çûn.

**Sal hezar** û **çil** û **yek** çûn''

**4.2. Navdêrên Nejimarbar:** Tiştên ku bi heban nayên jimartin ji wan re nejimarbar tête gotin.

**Mînak:** Hirî, giya, av, goşt, şîr, mast, dew û hwd.

Em çend mînakan jî di nav hevokê de bidin:

**Hiriya** miyan pir baş e.

Îsal li serhedê **giya** pir e.

Dibêjin **şîrê** kerê bi hêz e, lêbelê bê tam e.

**Goşt**ê çivîkan pir xweş e. (Çivîk dibêje ez gezek im, beramberê pezek im.)

**5. Ji Aliyê Zayendê ve Navdêr**

Di hinek zimanan de du cure zayend hene. Yek ji wan zayenda biyolojîk e û di hemû zimanan de heye. Zayenda biyolojîk ji bo giyanewer, mirov û ajalan heye. Ji van heyinan hinek nêr û hinek mê ne. Zayenda din jî zayenda rêzimanî ye û di hinek zimanan de heye. Di kurdiya kurmancî û zazakî de zayenda rêzimanî heye. Yanî hemû tişt an mê ne an jî nêrin. [9]

**5.1. Zayenda Biyolojîk:** Zayenda biyolojîk ji bo giyanewer, mirov û ajalan heye û hinek nêr û hinek mê ne.[10]

**5.1.1. Navdêrên Nêr:** Giyanewerên ku zayenda wan nêr e, wekî navdêrên nêr tên pajirandin.

**Mînak:** Mam, xal, bav, kur, mêr, nêrî, dîk, ga, beran, axte û hw.

Em dikarin van mînakên xwe di hevokêde jî nîşan bidin da çêtir bê fêmkirin.

Mam**ê** min ji dibistanê hat.

Neriy**ê** me ceh pir xwar û bi‘ecî.

Axt**ê** axayê gund pir beza bû.

**5.1.2. Navdêrên Mê:** Giyanewerên ku zayenda wan mê ne, wekî navdêrên mê tên pajirandin.

**Mînak:** Jin, dayîk, mirîşk, çêlek, bizin, mihîn, maker û hwd.

Ji bo ku mînakên me baş betin fêmkirin em van mînakan di hevokê de jî bidin:

Jin**a** malê pir jêhatî bû.

Dayik**a** min pir dilşewat e.

Golikên baş ji çêlek**ên** baş çê dibin.

[9] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Stenbolê, Stenbol, 2005, r.104-106.

[10] Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Weşanên Dîwan, Stenbol, r.78.

**5.2. Zayenda Rêzimanî:** Cureyê duyemîn ê navdêran di binyada xwe de ne xwediyê tu zayendê ne, lê kurmancan ew wekî nêr an ji mê diyar kirine. Lewra jî hinek zimanzan wê wekî "zayenda derewîn'' jî bi nav dikin. Zayenda van navdêran bi riya tewang û veqetandekan tê naskirin. Divê neyê jibîrkirin ku zayenda siruştî (biyolojîk) jî bi riya tewang û veqetandekê tê nimandin.

Her wekî tê zanîn peyvên mîna "kevir, dar, xanî, behîv, sêv, pênûs, gel, welat, çiya" di rastiya xwe de ne xwediyê tu zayendê ne. Lê di kurmancî de hinek ji wan mê ne, hinek jî nêr in.[11]

**5.2.1. Navdêrên Nêr:**

**a.** Hemû hevenav û serenavên giyanewer ên nêr, nêr in.

**Mînak:** Bav, kal, mam, bira, pismam, xal, Elî û hwd.

**b.** Ji bilî hejmara yekê, hemû jimarnav nêr in.

**Mînak:** Pazdeh ê mehê, Pêncê gulanê û hwd.

**c.** Navên rengan dema wekî navdêr bên bikaranîn nêr in.

**Mînak:** Keskê hinê, Sorê sêvan, Zerê hirmiya û hwd.

**d.** Goşt, hirî, hêk, şîr û hamû berên ku ji sewalan tên bidest xistin nêr in.

**Mînak:** Goştê mirîşka, şîrê bizina, qeymaxê gamêşa û hwd.

**e.** Ciwa ne têde hemû navên metalan nêr in.

**Mînak:** Hesin, zîv, zêr, pola û hwd.

**f.** Şemamok ne têde hemû berên bostan nêr in.

**Mînak:** Zebeş, petêx, kundir, dolmik û hwd.

**5.2.2. Navdêrên Mê:**

**a.** Hemu giyanewerên mê, mê ne.

**Mînak:** Hêlîn, Zîn, xaltî, bizin, mirîşk, dotmam, met, dapîr û hwd.

**b.** Hemu alavên ragihandinê mê ne.

[11] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Stenbolê, Stenbol, 2005, r.106-108.

**Mînak:** Balafir, keştî, maşîn û hwd.

**c.** Ji bilî xanî, kon û axûrê hemû cî û wargeh mê ne.

**Mînak:** Wargeh, dibistan, park, qad û hwd.

**d.** Navê rojan, navên deman, danên rojê, meh û salan mê ne.

**Mînak:** Sêşem, êvar, meh, hefte, saet, şev, deqe, saniye û hwd.

**e.** Hemû serenavên coxrafîk mê ne.

**Mînak:** Wan, Îran, Rûsya, Ewrupa, Asya û hwd.

Her çi qas me van mînakan dabe jî em nikarin bibêjin ku ji sedî sed rast e û bi vî awayî ye; lewra hinek tîpên awarte jî hene. Ji ber vê yekê ku kêmasî mabin em lêborînê dixwazin.

**5.2.3. Navdêrên Nêtar (Nêremê):** Di kurmancî de hinek navdêr ji ber ku her du zayendan digrin, ji aliyê zayendê ve wek nêtar anjî nêremê hatine binavkirin. Zayenda van navdêran hem bi alîkariya tewang û veqetandekê, hem jî bi alîkariya peyv û qertafan diyar dibe. Gelek caran mirov bi alîkariya peyvên nêr û mê jî zayenda wan diyar dike. [12]

**Mînak:**

**Mamosteya** min li pirtûkxaneyê ye. (Mê)

**Mamosteyê** min li pirtûkxaneyê ye. (Nêr)

**Havala** min ji bajêr hat. (Mê)

**Hevalê** min ji bajêr hat. (Nêr)

**Dengbêja** dengxweş Xana Zazê hatibû. (Mê)

**Dengbêjê** dengbêjan Evdal e**.** (Nêr)

**6. Peyvsaziya Navdêran**

Ji aliyê peyvesaziyê ve navdêr ji hev cuda dibin. Hinek ji wan xwerû ne, hinek ji wan jî ne xwerû ne. Yên ku nexwerû ne, hinek ji wan pêkhatî û hinek ji wan hevedudanî ne.

[12] Çetîn Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Weşanên Dîwan, Stenbol, r.80.

Navdêrên xwerû ji hev nabin, ên pêkhatî bi alîkariya paşgir, pêşgir û navgiran pêk hatine, yên hevedudanî jî ji çend hêmanên serbixwe pêk hatine.

**6.1. Navdêrên Xwerû:** Navdêrên ku ji hemanekê pêk hatine, navdêrên xwerû ne. Navdêrên xwerû dema ku parçe bibin, wateya xwe ji dest didin.

**Mînak:** Aş, nav, meh, temen, şur, kêr, cot, mar, sêv, mal, gel, ceng, tas, dev, pî, mil, pêçî, dest, diran, poz, guh, deng û hwd.

Em dikarin ji bo fêmkirinê vê mînaka gelerî bidin:

"Bi heft **mal**a **legan**ek

Bi heft **pîr**a **diran**ek

Bi heft **xort**a **desmal**ek..."

**6.2. Navdêrên Nexwerû:** Navdêrên nexwerû ji bilî navdêrên xwerû hemû cure navdêran digirin nava xwe. Mirov dikare navdêrên nexwerû wekî navdêrên hevedûdanî, pêkhatî û komleks dabeş bike. Ji ber ku navdêrek dibe ku hem hevdûdanî, hem jî pêkhatî be; navdêreke hevdûdanî dikare qertafan wergire.

Her wiha navdêreke pêkhatî jî dibe ku bi gotineke din re bibe yek û navdêreke nû pêk bîne. Mirov dikare navdêrên bi vî rengî wekî navdêrên kompleks bi nav bike.[13]

**6.3. Navdêrên Pêkhatî:** Navdêrên pêkhatî ji hêmaneke serbixwe û ji pêşgir, paşgir û navgiran pêk tên.

**Mînak:** Avî, xaltî, rojî, derî, hevaltî, biratî, mêvanî, pahlewanî û hwd.

Em di hevokê de jî çend mînakan bidin ji bo ku bê fêmkirin.

**Hevaltiya** me ev bîst sal e didome.

Bûka nû çûbû mala bavê xwe bi **mêvanî**.

Şenga min Penga min dayik çûye zozanan... ka **derî** li diya xwe vekin...

Erdê gund bi piranî **avî** ye.

[13] Çetîn Taş, *h.b,* r. 83

**6.4. Navdêrên Hevdudanî:** Navên ku bi hindikî ji gotinên biwate pêk tên. [14]

**Mînak:** Avşork, avazer, avbacan, avgoşt, avrû, pismam, dotmam, dotmîr, pisaxa, marmasî, pezkuvî, gakuvî, kalemêr, dapîr, bapîr, sermezin, serhişk û hwd.

Di hevokê de çend mînak:

Siyabend tîra xwe avêt **pezkûvî.**

Derwêşê Evdî evîndarê **Pismama** xwe Edûlê bu.

Evdo zarokekî **devav** bû.

**7. Navdêrên Binavkirî û Nebinavkirî**

Di kurmancî de navdêrek dema bi tena serê xwe hate nivîsandin, binavkirî ango diyar e.

**Mînak:**

**Zilam** hat.

**Keçik** çû.

Me **gund** dît.

Di helbestê Feqîyê Teyran de em dikarin van mînakan bi awayekî balkêş bidin nîşandan.

"Dinav **gul**an da **xar**im bi îsmê **Muhammed** navim. ''

"**Av**a mezin qîrqîr neke ehlê **Xwedê** acis neke…''

"**Şêx**ek hebu **Sen'an**iya **serdar**ê pênsed **sofiy**a. . ''

Navdêrên di van mînakan de bahsa wan tê kirin tev kes û tiştê nas û binavkirî didin nasîn. Navdêrên binavkirî bi alîkariya qertafên nenasiyê "-ek" û "-in" tên bidestxistin. Ji van qertafan "-ek" her wekî diyar e ji cînavka nebinavkirî "yek" tê û navdêra yekjimar dike nebinavkirî.

[14] Kadrî Yildirm, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi,* Weşanên Zanîngeha Artukluyê, Stenbol, 2012, r. 192.

**Mînak:**

Şêx**ek** hebû çaxê ewil nûra Xwedê hilbû li dil.

"Şêxê me şêx**ek** heciye xelkê keramet jê diye.

Piştî şîvê tas**ek** şerbet vexwar.

Min li zozana mal**ek** pir xweşik avakir.

Her wiha qertafa "in" jî ji cînavka nebinavkirî hin tê û bêjeyên pirjimar û nenas nîşan dide.[15]

**Mînak:**

Heval**in** hatin.

Wê av**in** vexwar.

Wan dar**in** birîn.

Keçik gul**in** kirîn.

### 8. Gelemperîkirina Navdêran

Di kurmancî de navdêr tên gelemperîkirin û bi vî awayî dibin nebinavkirî. Gelemperîkirin bi vî rengî pêk tê; navdêr tê dubarekirin, gihaneka "û" dikeve navbera navdêra dubarî û tîpa "m" cihê tîpa yekemîn a bêjeya duyemîn digire.

**Mînak:** Tişt û mişt, kinc û minc, ser û mer, dest û mest, tilî û milî, çav û mav, erd û merd, av û mav û hwd.

Îcar em di hevokê de li van mînakan binihêrin.

Dev ji van **tişt û miş**tan berde.

Li çolê **av û mav**a we heye an na?

Digel vê rêbazê di hin bêjeyan de jî dîsa bêje tê dubarekirin, gihanek dikeve navbera wan û îcar tîpa navîn a bêjeya duyemîn bi "û"yê tê guhartin.[16]

**Mînak:** Kes û kûs, naz û nûz, pars û pûrs… û hwd.

---

[15] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Stenbolê, Stenbol, 2005, r. 116

[16] h.b.r. 117.

**9. Peywira Navdêran**

Di nava hevokê de navdêr bi karekî dadikeve, bi gotineke din peywirekê digire ser xwe, guherînên ku di wê de çêdibin jî li gorî peywira ku girtiye ser xwe pêk tîne. Di nava hevokên bi lêkerên gerguhêz de navdêrek an kirde ye an jî bireser e. Heke mirov bi awayekî din bibêje, yan karê ku tê kirin ji aliyê navdêrê ve tê kirin, an jî ew kar li ser wê pêk tê. "Zozanê sêv xwar" di vê mînakê de du navdêr hene; navdêra serenav "Zozan" û navdêra hevenav "sêv" e. Di hevokê de "Zozan" kirde ye; lewre kar ji aliyê wê ve tê kirin, lê navdêra hevenav "sêv" bireser e; lewre ew kar tê serê wê, yanî tiştê ku tê xwarin "sêv" e.

Di hevokên bi lêkerên negerguhêz navdêr dikare bibe hoker jî.

**Mînak:** Qenco diçe Amedê. (Amed bûye hokera cî.)

Gavan ji naxirê tê. (naxir bûye hokera cî.)

**9.1 Raveka Navdêran:** Di ravekê de navdêr hin caran raveker û hin caran jî raveber in.

**Mînak:** Bavê Zînê çû bajêr. **(Zînê** raveker, **Bav** raveber e, her du bi hev re raveka navdêran pêk tînin.**)**

Destê Birayê te hat birîn. **(dest** raveber e, **bira** hem raveber hem jî raveker e.**)**

Gûzên dara apê Hesen xweş in. (**Gûz** raveber, **dar** hem raveker hem raveber e**, ap** hem raveker hem raveber û **Hesen** jî raveker e.)

**9.2.Tewanga Navdêran:** Bi riya tewangê zayend û mêjera navdêrê tê nîşandan. Di hevokên bi lêkerên gerguhêz de di demên niha û dema bê de navdêrên bireser ditewînin.[17]

**Mînak:** Gul **avê** vedixwe.

Zîn dê **kincan** bişo.

Di demên borî de kirde ditewe.

**Gulê** av vexwar.

[17] Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012, r. 68.

**Şivên** pez anî.

Navdêrên ku li du daçekê tên ditewin. Lê belê daçekên ku hokerên hevedudanî pêk tînin, navdêra piştî xwe natewînin.

**Her wekî** "Azad bi lez çû dibistanê"

Bêrîtan **ji hêlekanê** ket.

Mamoste **li Elî** xist.

Firat **li televîzyonê** temaşe dike.

Di ravekê de raveker ditewe.

Guliyên **darê**.

Porê **dayikê**.

Xwişka **birayekî**.

Dara **gûzê** û hwd.

**9.3. Neyîniya Navdêran:** Di navdêran de neyînî bi alîkariya daçeka "ne" tê nîşandan. Ev daçek bi tena serê xwe berî navdêrê tê nivîsandin.

**Gûndî:**

Ez ne gûndî me.

Tu ne gûndî yî.

Ew ne gûndî ye.

Em ne gûndî ne.

Hûn ne gûndî ne.

Ew ne gûndî ne.

Her çi qas di hin devokan de piştî navdêran "nîn" û "nin" tê danîn û bi awayê "**Ez mamoste nîn im.**" neyînî tê kirin jî ev yek aloziyan pêk tîne, lewre "nîn" wateya nebûn û tunebûnê. [18]

[18] Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Stenbolê, Stenbol, 2005, r. 120.

**10. Reşkirin Xweşkirin Biçûkkirin û Bangewaziya Navdêran**

**10.1. Xweşkirin:** Di kurmancî de di navdêran de rewşa xweşkirinê heye ku ev jî taybetmendiyeke balkêş e ku di hindik zimanên cîhanê de heye. Ev hestewariya mirovî ya ku di hindik zimanan de tê xuyakirin e. Ev rewş bêtir li ser serenavan, carinan jî li ser navdêrên rengê serenavî de xuya dibe. Di vir de xweşkirin û reşkirin du rewşên têkildarî hev in. Pargîna wê jî taybet e. Ji bo navdêrên **mêza** "**-o"** ye, ji bo navdêrên **nêrza** "**-ê**" ye. [19]

**Mînak:** Gulîstan → Gulo

Miheme → Hemê

**10.2. Reşkirin:** Di kurmancî de di navdêran de rewşa reşkirinê heye ku ev jî taybetmendiyeke balkêş e ku di hindik zimanên cîhanê de heye. Ev hestewariya mirovî ya ku di hindik zimanan de tê xuyakirin e. Ev rewş bêtir li ser serenavan, carna jî li ser navdêrên rengê serenavî de xuya dibe.

Di vir de xweşkirin û reşkirin du rewşên têkildarî hev in. Pargîna wê jî taybet e. Ji bo navdêrên **mêza** "**-ê**" ye, ji bo navdêrên **nêrza** "**-o**" ye.

**Mînak:** Gulîstan → Gulê

Miheme → Hemo

**10.3. Biçûkkirin:** Di kurmancî de barlêkirina navdêrê ya bi rengê biçûkkirin û zemkirinê rewşek taybet e. Navdêr dema bi rengê biçûkanî bê nîşandan navdêr dikeve rewşek taybet. Pargîna wê jî taybet e. Pargîna biçûkkirinê "**-ik**" an jî "**-ek**" e. Rewşa biçûkkirin û reşkirinê têkildarî hev in. Dema ku biçûkkirin û reşkirin pêk tên wekî pargîn **"-ok**" heye. [20]

**Mînak:** **Dar** → dar**ik** → darik**ok**

**Law** → law**ik** → lawik**ok**

**Keç** → keç**ik** → keçik**ok**

**Tevr** → tevr**ik** → tevrik**ok**

**Jin** → jin**ik** → jinik**ok**

**Mêr** → mê**rik** → mêrik**ok**

[19] Azad Zal, *Zimanê Kurdî,* Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2009, r. 148

[20] Azad Zal, *Zimanê Kurdî,* Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2009, r.150-151.

**10.4. Bangewazî:** Yek ji aliyên hestewar ên ziman jî bangewazî ye. Pargînên vê rewşê ji bo mêza "**-ê**", ji bo nêrza "**-o**" û ji bo pirjimariyê "**-in**" e**.** Li gorî zayendê pargîna denglêkirinê tê ber navdêrê.

Di banglêkirina navdêrên **mêza** "**-ê**" de.

**Mînak:** Keç**ê**, xwişk**ê**, dîn**ê**, met**ê**, dotmam**ê**, day**ê** û hwd.

Ji bo banglêkirina navdêrên nêrza "**-o**" tê bikaranîn.

**Mînak:** Xort**o**, ap**o**, xal**o**, bav**o**, dîn**o** û hwd.

Ji bo banglêkirina navdêrên pirjimar "**-ino**" tê bikaranîn.

**Mînak:** Heval**ino**, gund**ino,** bajar**ino,** welat**ino** û hwd.

**11. Jimarnav**

Tiştê ku hene mîktar û hejmara wan bi jimarnavan tê binavkirin.[21]

**11.1. Jimarên Xwerû:** Hejmarên ku bi gotinekê tenê pêk tên.

| | | |
|---|---|---|
| **Mînak**: | 1 | yek |
| | 10 | deh |
| | 20 | bîst |
| | 50 | pêncî |
| | 100 | sed |
| | 1000 | hezar |
| | 1000000 | milyon |

**11.2. Jimarên Hevdûdanî:** Hejmarên ku bi hindikî ji du gotinan pêk tên. [22]

| | | |
|---|---|---|
| **Mînak:** | 11 | yazdeh |
| | 22 | bîst û dido |

[21] Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*, Weşanên Zanîngeha Artukluyê, Stenbol, 2012, r. 218.

[22] h.b, r.219.

| | |
|---|---|
| 33 | sî û sê |
| 44 | çil û çar |
| 55 | pêncî û pênc |
| 66 | şêst û şeş |
| 77 | heftê û heft |
| 88 | heştê û heşt |
| 99 | not û neh |
| 1041 | hezar û çil û yek |

## ENCAM

Navdêr, bi taybetmendiya xwe ku bi tena serê xwe jî bi wate ne wekî hemû zimanan di kurdî de jî ciyekî taybet digirin. Tiştê ku li kaînatê hebe û gava qala wê bê kirin û di hişê me de cî bigire, pewîst e navek jê re hebe. Ji ber vê yekê wekî hemû zimanan girîngiya navdêran di kurmancî de jî gelek e.

Zaravayê kurmancî wekî her aliyê din ê rêzimanî, ji aliyê navdêran ve jî dewlemend e. Di nava gel de alavek bi sê heta bi çar navên cuda hatine binavkirin. Ku em mînakek bidin (acı) li hinek ciyan dibêjin **tûj,** li hin ciyan dibêjin **têz,** li hin ciyan dibêjin **no,** li hin ciyan jî dibêjin **dijwar**.

Disa taybetmendiyeke navdêrên kurmancî ew e ku **zayend** têde heye. Lewra zayend di pirê zimanên cîhanê de tuneye. Yanî di kurmancî de her tişt an mê ne an jî nêr in.

Taybetmendiyeke din a navdêrên kurmancî ew e ku reşkirin, xweşkirin û biçûkkirin têde heye. Di nav gel de ji vê yekê re xerakirina navan jî tê gotin.

Di vê pirojeyêde me li gor zanebûna xwe li ser navdêrên kurmancî xebat kir û hinek taybetmendiyên wan aşkere kir. Hêviya me ew e ku li ser navdêrên kurdî xetabên berfirehtir û bihêztir bên kirin.

# ÇAVKANÎ


Baran, Bahoz: *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012

Bilbil, Mikaîl & Baran, Bahoz: *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Kurdiya Amedê, Stenbol, 2008

Încekan, Abdullah: *Ez Kurdî Hîn Dibim*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2009

Kurdo, Qanatê: *Rêzimana Kurdî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2013

Samur, Azîz: *Kurdiya Kurmancî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2012

Tan, Samî: *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstîtuya Stenbolê, Stenbol, 2005

Taş, Çetîn: *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Weşanên Dîwan, Stenbol, 2011

Yıldırım, Kadri: *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*, Weşanên Zanîngeha Artukluyê, Stenbol, 2012

Zal, Azad: *Zimanê Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2009